

## Rêwîtiya Rojê dest pê dike

Rêwîtiya Rojê ku 21 sal berê ber bi Amarayê ve dest pê kiribû, dîsa dest pê dike. Her sal bi hezaran kurd berê xwe didin Amarayê û dest bi rêwîtiya Rojê dikin. Kurd rojbûna Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan rojbûna xwe dibînin... *R.3*



## Li dijî 926 kesan êrîşa zayendî

Piştî ku Şaredarê Şaredariya Bajarê Mezin a Stenbolê Ekrem Îmamoglû hat girtin çalakiyên welatiyan pêşketin. Di binçavkirina welatiyan de polîsan tundî li welatiyan kirin. Jinên tev li çalakiyan bûne rastî tundiya zayendî jî tên... *Medya Bal/R.2*



## Aqubetê çerkezkî nîro kurdkî ser

Tirkîya de 18 ziwanî vînî bîyê. Çerkezkî û lehçeyê çerkezkî zî sey ziwanê kurdkî zî polîtîkaya asîmîlasyon û qedexekerdişî ser o hîna binê telûke de yê. Eke bi ziwanê dayîke perwerde kurdkî nêbo do aqubetê çerkezkî bêro kurdkî ser... *Lêl AMED / R.15*

31 Adar - 6 Nîsan 2025
Hejmar: 276
Buha: 20 TL
rojname@xwebun.org

# xwebûn

xwenasîn e

# Roj Amara ra vejîya

Tarîxê kurdan de xeylêk rayberî ciwîyayî. Mîsal Kawayê Asinkarî Îsayî ra ver serra 612yî de hêrişê seraya Dehaqî kerd, adirê Newroze wekerd û şarê xo azad kerd. Mîsal Şêx Ubeydullahî Colemêrg de peynîya seserra XIX. de vera Dewlata Osmanîyan xoverdayîşêko rûmetdar kerd. Yewna Şêx Seîdî embazanê xo reyde serra 1925î de vera Komara Tirkîya xover da û bedelê giranî dayî. Dima ra Dêrsim de serra 1937î de Seyîd Rizayî şarê kurdî rê rayberîye kerde û têkoşînê azadîye ra çi hele fek vera nêda. Rejîmê tirkan vera kurdan her tewr zulm viraşt. Nîjadperestîye, qetlîyamî, asîmîlasyon yanî bi kilmî polîtîkaya îmha ameye caardene. Gama ke serranê 1970an de têgêrayîşê PKK'yî dest pêkerd, her çî bedilîya. PKK hemverê biluskê netewe-dewlete sey "paratoner" peyda bî. Bêguman rêxistine de merdimanê dîyarkeran ra yew Serekê PKK'yî Abdullah Ocalan bî. Ey serranê unîversîte ra pey zerrî daye embazanê xo, semedê têkoşînî însîyatîf girewt xo dest û dest pê xoverdayîşêkê bêhempayî kerd. Fikro ke Amara de vejîya rîyê asmênî, bi taybetî na seserre çar leteyanê Kurdîstanî de tesîrêkê girdi virazeno. Pêro merdimîye şahidê şorişo ke Rojawan de ramîno bena. No şoriş zafane sey "sosyalîzmo lîberter" hesibîyeno. Kantonî, meclîsê şarî, komunî sey elementê cuya hempare vejînê vernî. Şorişê Rojawanî bêguman kurdanê leteyanê bînan ê Kurdîstanî ser o zî tesîr keno. Demê ameyoxî de Bakûr, Başûr ve Rojhelat de hişmendîya komunale do qetî bêro awankerdene. Serekê PKK'yî Abdullah Ocalan her tim vano ke "Çiyo ke muhîm o azadîya mi nîya, azadîya pêro şaran a..." *R.15*



## Evîna Azadiya Welat

Di ser şehatedta hevala me Rojnameger Evîn Bûldan re 8 sal derbas bûn. Ger mirov bi hevaleke mîna Evînê re xebitî be, gelekî zehmete ku behsa serpêhatî û girêdana wê ya doza Kurd û Kurdistanê bike. Li aliyekî bîranîn li ber çavên mirov zindî dibe, li aliyê din hest û hesreta salên bê Evîn û bêdawî. Ew evîndara doza Kurd û Kurdistanê bû. Ew Evîna Azadiya Welat bû. Em ê tu carî te ji bîr nekin Evîna Welat. (Edîtorya)



## Milyonek mirov bê av man

Endamê Komeleya Mafên Mirovan a Firatê Ahmet Dawut, bal kişand ser êrîşên li dijî Kobanê û diyar kir ku di encama êrîşên Tirkiyeyê yên 4 mahên dawî de milyonek mirov bê av û ceyran man. Dewleta Tirk ji 8ê Kanûna 2024an ve êrîşên li ser herêma Kobanê zêde kirine. Ji 8ê Kanûnê heta niha di êrîşan de 17 jê jin bi giştî 105 welatî hatin kuştin. Ji 105 kesan 35 zarok in. Di êrîşan de 196 kes birîndar bûn. Ji kesên birîndar 43 zarok 50 kes jî jin in. Di êrîşê de 7 endamên asayîşê û 3 rojnameger hatin kuştin û 2 rojnameger jî birîndar bûn. Di êrîşê de 2 karmendên tenduristiyê hatin kuştin û 5 kes birîndar bûn... *R.3*

## Konferansa Azadiya Ocalan

Konferansa 19emîn a YE, Tirkiye, Rojhilata Navîn û Kurd ku li paytexta Belçîka Brukselê li Parlamenta Ewropayê (PE) hat lidarxistin, bi dawî bû. Piştî konferans bi dawî bû encamname bi raya giştî re parve kirin. Di biryarê de hate bibîrxistin ku li Tirkiyeyê ji bo çareseriya meseleya Kurd gavên girîng têne avêtin û wiha hate gotin: "Banga Aştî û Civaka Demokratîk ku Rêberê Siyasî yê Kurd Abdullah Ocalan di 27ê Sibata 2025an de kir, ne tenê ji bo Tirkiye, ji bo tevahiya herêmê ji bo çareserkirina girêkê derfetekî bêhempa pêşkêş dike. Pêkanîna azadiya Abdullah Ocalan ku ji bo ku rola xwe bi awayekî guncaw bi cih bîne mecbûrî ye.

## Wê bibe xwediyê pêşerojekê



Waliyê Silêmaniyê Dr. Heval Ebûbekîr li ser "Banga Aştî û Civaka Demokratîk" a Abdullah Ocalan axivî û diyar kir ku sed salên windakirî nîşan didin ku ne Kurd û ne jî dewletên herêmê ji vî şerê bêdawî sûd nedîtinin û got: "Divê Kurd dîroka xwe bixwînin: Îro ne dema pevçûnê, lê dema biryardariyê ye. Yekîtî bibe prensîba sereke û Kurdistan dê bibe xwediyê pêşerojekê." *Hevpeyvîna Rohat Bulut R-4*

## Pêşengiya yekîtiya neteweyî



Jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ku xwe bi îdeolojiya azadiya jinan bi çek kirine, bêhna azadiyê kişandine û çirûska şoreşa 19ê Tîrmehê di dilê xwe de geş kirine, îro gaveke nû di têkoşîna azadiya jinên Kurdistanê de davêjin. Mirov dikare konferansa neteweyî ya jinên kurd weke xebateke giring û serencama karên şoreşê bi nav bike. Ji ber ku jinan tu carî serî netewandine... *Lîlav Elî / R.2*

# Bi pêşengiya jinan ber bi yekîtiya neteweyî ve

Lîlav Elî

Jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ku xwe bi îdeolojiya azadiya jinan bi çek kirine, bêhna azadiyê kişandine û çirûska şoreşa 19ê Tîrmehê di dilê xwe de geş kirine, îro gaveke nû di têkoşîna azadiya jinên Kurdistanê de davêjin.

Di 13 salên aloziya Sûriyeyê de bi taybet bi Şoreşa 19ê Tîrmehê re Jinên Rojava bi armanca avakirina civakeke demokratîk, exlaqî û siyasî pêşengtî ji şoreşê re kirin, şoreşek di nava şoreşê de ava kirin û li hember xetertirîn terora di cîhanê de şer kirin, axa xwe parastin û hebûna xwe îsbat kirin.

Bi taybet di daxuyaniya "Banga Aştî û Civaka Demokratîk" de Rêber Abdullah Ocalan bal kişand ser pirsgirêka jinan û got: "Doza jinan di civakê de ji doza kurdî kurtir e". Bi vê bangê re jinên li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê têkoşîna xwe ya ber bi jiyaneke wekhev, azad û demokratîk ve derbasî qonaxeke nû kirin, jinan li ser felsefeya "Jin Jiyan Azadî" têkoşîna xwe ya siyasî mezin kirin û pêşengtî ji avakirina yekitiya neteweyî ya jinên kurd re kirin. Bi baweriya ku jin dikare pêşengtiyê ji pêvajoya heyî ya li Sûriyeyê her wiha li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bike, amadekariyên ji bo yekkirina aliyên kurdî û li darxistina kongreyeke niştîmanî ya kurdistanî ji bo çareserkirina pirisgirêka kurd tê kirin.

Di vê çarçoveyê de di 23yê adarê de bi armanca yekkirina nêrînên jinan û xurtkirina hevgirtina wan a li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, herwiha weke berdewamkirina xebatên her du konferansên neteweyî yên jinên kurd bi dirûşma" Bi pêşengtiya Jinên Kurd Yekîtiya Neteweyî ya Kurd Misoger dibe" Konferansa




Jinên kurd ên li Rojava bi lidarxistina vê konferansê re careke din tovên ber bi jiyaneke azad, pirreng û demokrat ve ku tê de alaya doza kurdî her li ba be, li ser xaka Sûriyeyê reşandin

Yekemîn a Jinên Kurd li Rojava hat lidarxistin. Jinên Rojava bi lidarxistina vê konferansê re careke din tovên ber bi jiyaneke azad, pirreng û demokrat ve ku tê de alaya doza kurdî her li ba be, li ser xaka Sûriyeyê reşandin.

Desthilata nû ya Şamê ku xwe li ser Sûriyeyê ferz dike, ji bo derbkirina destkeftiyên jinan ên 13 salan û jinûve bindestkirina jinan, beşdariya jinan a di nava karûbarên welat de nas nake, wê dûrî girtina biryarê dixe. Herwiha yek reng, yek ol û yek zimaniyê di nav xwe de dihewîne û rê li ber pirrengiya çandî, zimanî, bawerî û netewbûna li Sûriyeyê digire. Anku bi her awayî jinan bêrol dike û li ser vê yekê jinan di konferansê de tekez kirin ku avakirina Sûriyeke Demokratîk, nenavendî û pirrengî hem armanca sereke ya hemû pêkhateyên Sûriyeyê ye, hem jî garantîkirina mafên jinan e. Konferansê projeya Rêveberiya Xweser a ku xwe li ser bingeha projeya Netewa Demokratîk, azadiya jin û ekolojiyê birêxistin dike û di her gavê de parastina mafên pêkhateyan bingeh digire, ji bo çareserkirina tevahî pirsgirêk û aloziyên Sûriyeyê modela herî guncav dît.

Ji bo ku kiryar û polîtîkeyên înkar û çewsandinê yên ku rejîma berê li ser gelê Sûriyeyê bi taybet jinan dida neşandin dubare nebin û dawî li êş û azarên jinên Sûriyeyê were, jinan di konfransê de reşnivîsa Sûriyeyê ya nû red kirin û daxwaz ji Hikûmeta Şamê ya Demkî kirin ku li gorî prensîbên biryara navneteweyî ya 2254ê bimeşe û jin di pêvajoya diyalog û rolan de ne kêmî ji sedî 50 bin, herwiha bendên ji bo mafên jin di hevpeymana civakî ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê de hatine bicihkirin, ji bo destûra nû ya Sûriyeyê jî esas bên girtin.

Ji ber ku jinan di dirêjahiya Şoreşa Rojava û Sûriyeyê de berdêlên pir giranbuha dan û ji bo avakirina Sûriyeke ne navendî, demokratîk û pirreng têkoşîna xwe didomînin.

Ev têkoşîn û serkeftina jinên kurd li Rojava pêlên xwe derbasî paytextên din ên Sûriyeyê kiriye. Di roja îro de jinên li Siwêda, Berav û Şamê hewl didin bi jinên Rojava re têkiliyê deynin da ku ji tecrûbeyên wan ên rêxistinî û siyasî sûdê wergirin. Çawa ku jinan bi şoreşa Rojava re bi reng, ol, nasname û zimanê xwe beşdarî qadên jiyanê bûn, biryar girtin û bûn berpirsyarên birêxistinkirina civakê, îro careke din xwe di ber avakirina Sûriyeya nû de berpirsyar dibînin. Ji lew re jinan di konferansê de tekez kirin ku avakirina Sûriyeke Demokratîk, nenavendî û pirrengî hem armanca sereke ya hemû pêkhateyên Sûriyeyê ye, hem jî misogerkirina mafên jinan e.

Konferansa ku bi pêşengtiya jinên Rojava hat lidarxistin ji bo avakirina yekîtiya neteweyî ya jinên kurd bû bingehek û dê pêşengtiyê ji yektiiya di navbera gelên din de bi taybet partiyên kurd de bike. Dê jin bikaribin roleke sereke di qadên siyasî û civakî de bilîzin herwiha cihê xwe di nivîsandina destûra Sûriyeyê de ku mafên tevahî sûriyeyiyan biparêze de bigirin. Jina kurd ku bi têkoşîn û berxwedana xwe ya li ser bingeha felsefeya azadiyê axa xwe ji gefên dagirkirinê parastin. Rêxistinbûyîna jinên kurd a li rojavayê Kurdistanê bûye îlhama azadiyê ji tevahî jinên Sûriyeyê re.

Jinên kurd ne tenê di nava Sûriyeyê de lê belê di asta gerdûnî de bûne modela rizgariya jinan, ji bo avakirina polîtîkayên ku karibin mafên jinan di nava civakan bi dest bixin, ji bo bilindkirina asta têkoşîna jinan û xurtkirina rola jin di hemû qadan de, ji bo yekkirina kar û xebatên jin, ji bo pêkanîn û çêkirina nêrîneke siyasî ya hevbeş a hemû kurdên Sûriyeyê, ji bo bicihkirina demokrasî û edaleta civakî, xebatên xwe dikin yek û mezintir dikin. Îro bi pêşengtiya jinên kurd li Rojava têkoşîna bidestxistina mafên jinên tevahî Sûriyeyê tê kirin.

Mirov dikare konferansa neteweyî ya jinên kurd weke xebateke giring û serencama karên şoreşê bi nav bike. Ji ber ku jin rastî îşkence, planên qirkirin û çokdanînê hatin, tu carî serî netewandin û heta ku gihaştin konferansa xwe ya neteweyî.

Lidarxistina vê konferansê ji bo tevahî jinên kurd ên li her aliyên Kurdistanê û diasporayê dikare bibe bingehekî xurt û li ser wî esasî sêyemîn konferansa neteweyî ya jinên kurd a li ser asta her aliyên Kurdistanê were lidarxistin ku careke din jinên kurd bi hev re siberoja welatê xwe nîqaş bikin û bi hev re bigihêjin lêvegereke bingehîn.







# 926 kes rastê êrîşa zayendî hatin

Medya Bal

Piştî ku Şaredarê Şaredariya Bajarê Mezin a Stenbolê Ekrem Îmamoglû hat girtin li deverên cuda çalakiyên welatiyan pêşketin. Di dema binçavkirina welatiyan de polîsan tundî li welatiyan kirin. Ew dîmenên ku li bajarên Tirkiyeyê tên kişandin bi salane li Kurdistanê rojane tên jiyîn. Jinên ku tev li çalakiyan bûne ji bilî tundiya fizîkî rastê tundiya zayendî jî tên.

Mijara tacîz û tecawiza li ser jinan a di bin çavan de ne mijareke nû ye. Jinên ku li hemû welatan di nav pergala mêrperest de tên binçavkirin rastê heman kiryaran tên. Lê li welatên wek Tirkiye ku hewl dide serweriya xwe bi tundî bide qebûlkirin de taciz û tecawiza di bin çavan de wek rêbaz tê bikaranîn. Mînakên vê yekê jî mixabin gelek in.

Di salên 90î de Dewleta Tirk li dijî PKKê û welatiyên kurd dest bi pêngaveke binçavkirinê kiribû. Elbet pêşiya salên 90î êrîşên li ser van aliyan zehf bûn lê di salên 90î de ev êrîş gihiştin asta herî jor. Di vê pêvajoyê de welatiyên ku hatin binçavkirin rastê tundiyên cur be cur hatin. Bi taybet êrîşa zayendî ya li ser jinan ji bo têkbirina îradeya wan hat bikaranîn. Li dijî van êrîşên ku hatin pêkanîn gelek jin bi salannikaribûn behsa tundiya ku pêre rû bi rû mane bikin.

Eren Keskîn a ku bi salan parêzeriya jinan kir di 1995an de bi hinceta nivîseke xwe hat girtin û di girtîgehê de bi jinên ku rastê tacîz û tecawizê hatine re ma. Eren Keskîn dema ji girtîgehê derket bi parêzera alman Jutta Hermans re ji bo karibe li dijî tundiya zayendî ya di bin çavan de derbikeve di sala 1997an de 'Buroya Alîkariya Huqûqî Ya Li Dijî Taciz û Tecawiza Di Bin Çavan De' ava kir.

Li ser xebata ku ji aliyê Eren Keskîn û Jutta Hermans di sala 1997an de hatiye destpêkirin heta sala 2023yan bi tevahî 871 jin serî li buroyê dane da ku karibin li dijî taciz û tecawiza ku di bin çavan de rû bi rû mane teşîr bikin.

Li gor daneyên ku Buroya Alîkariya Huqûqî Ya Li Dijî Taciz û Tecawiza Di Bin Çavan De ji bo sala 2024an parve kiriye de jî tê gotin ku 55 jin di bin çavan rastê taciz û tecawizê hatine û ji bo alîkariyê serî li buroyê dane.

Dema mirov li rastiya Tirkiyeyê dinêre dizane ku ev hejmarên ku serî li buroyê dane rêjeke kêm ya kesên ku di bin çavan de rastê taciz û tecawizê hatine ye. Ji bo hejmara kesên di bin çavan de rastê êrîşa zayendî tên zêde nebe divê ku cuhadiya neteweya mexdûr li ber çavan neyê girtin û têkoşîneke hevpar bê meşandin.

# Rêwîtiya Rojê dest pê dike



Kurd û Kurdistanî ji 4ê Nîsana 2004an heta niha 21 sal in berê xwe didin Amarayê û dest bi Rêwîtiya Rojê dikin. Kurdistanî dîsa di pêşengiya Meclisa Ciwanan û rêxistinên demokratîk de di 1ê Nîsanê de dest bi Meşa Rêwîtiya Rojê dikin

| Navenda Nûçeyan

Rêwîtiya Rojê ku 21 sal berê ber bi Amarayê ve dest pê kiribû, dîsa dest pê dike. Her sal bi hezaran kurd berê xwe didin Gundê Amarayê û dest bi rêwîtiya Rojê dikin. Gelê Kurd rojbûna Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan wekî rojbûna xwe dibînin.

Ji 2004an heta niha her sal 4ê Nîsanê salvegera rojbûna Abdullah Ocalan bi çalakî, meş, çandina daran û gelek bernameyên cuda pîroz dikin. Bi hezaran welatî ji sala 2004an heta 2017an ji bo biçin Amara û rojbûna Abdullah Ocalan pîroz bikin tevî hemû astengiyan meşên girseyî li dar xistin. Bi hezaran kes li gel nûnerên saziyan ji bo 4ê Nîsanê pîroz bikin bi dirûşma "Azadiya Rojê" berê xwe dan gundê Amara û dest bi "Rêwîtiya Rojê" kirin.

Piştî darbeya 15ê tîrmeha 2016an û şûnde desthilata AKPê OHAL hincet nîşan da û ji 2017an û vir ve 8 sal in astengiyan derdixin û ketina gund qedexe dikin. Lê her çend ketin û derketina Amarayê qedexe bikin û herêma qedexe îlan bikin jî dîsa Kurd xwe digihînin Amarayê û li Amara Rojbûna Ocalan pîroz dikin. Her çend bi leşker bi fermana Waliyê Rihayê astengiyan derxînin jî dîsa gel astengiyan nas neke û xwe diçin Amarayê.

Îsal bi milyonan Kurd û Kurdistaniyên ku beşdarî Newrozên bi heybet bûn, xwe amade dikin ku biçin Amara û dest bi Rêwîtiya Rojê bikin. Endamên Meclisa Ciwanan a DEM Partiyê dê di navbera 1 û 4ê Nîsanê de bi dirûşma "Em bi civaka demokratîk re ber bi azadiyê ve dimeşin" meşekê li dar bixin.

Ciwan dê di 1ê Nîsanê de ewilî têkildarî meşê li Qada Şêx Seîd a navçeya Yenîşehîr a Amedê daxuyaniyê bidin û dû re ber bi gundê Amaraye yê navçeya Xelfetî ya Rihayê ve dest bi meşê bikin. Dê bi sedan ciwan 4 rojan bimeşin.

# Banga Abdullah Ocalan digînin hemû kesan

| Mehmet Alî Ertaş

Şandeya ku ji Hevserokê Giştî yê DBPê Keskîn Bayindir, Hevberdevkên Komîsyona Têkiliyên Derve ya DEM Partiyê Berdan Ozturk û Ebrû Gunay, Parlamentera DEM PArtiyê ya Mêrdînê Salîha Aydenîz û endama TJAyê Adalet Fîdan pêk dihat li Silêmaniyê bi gelek rayedaran re hevdîtin kir. Şandeyê bi Serokkomarê Iraqê Abdullatîf Reşîd, Waliyê Silêmaniyeyê, nûnerên KNK, Tevgera Goran, Tevgera Helwest û Eniya Gel re rûnişt. Dîsa bi rêxistinên civakî, nûnerên baweriyên Misilman, Zerduştî, Êzidî, Kakaî, Katolîk re hevdîtin kir.

Endama Şandeyê û Parlamentera DEM Partiyê Saliha Aydenîz ewil li ser armanca serdana partiyên siyasî axivî û got: "Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di 27ê Sibatê de banga "Aştî û Civaka Demokratîk" kir. Piştî vê bangê li çar aliyên Kurdistan û cîhanê nûnerên sazî, rêxistin û baweriyan piştgirî dan vê bangê. Hin kesan jî xwest vê bangê berovajî bike. Me xwest em vê bangê li her derê û her cihî belav bikin û bidin famkirin. Ji gelek derdorên fireh ên welatên cîhanê piştgirî hat. Lê divê têkildarî naveroka vê peyamê vegotinek berfireh bê kirin. Ji partiyên başûr, sazî û rêxistinên sivîl ên başur, rewşenbîr, nivîskar û şexsiyetên pêşeng daxwaz hebû ku şandeyek biçe wir û li wir têkildarî peyam û bangê agahiyên berfireh bide. Xwestin li ser rol û misyona sazî û rêxistinên başûr niqaş bên kirin. Armanca şandeya duyemîn ew e ku bi hemû partî, sazî û rêxistinên li Slêmaniyê re hevdîtinan bike û naveroka bang û peyamê berfireh bîne ziman. Li Slêmaniyê ji bo 4 rojan hevdîtin hatine plankirin. Lê ji bo Hewlêr û bajarên din jî hevdîtin hatine plankirin. "

Gelek partî û rêxistin ziyaret kirin

Li ser nêzîkatiya partî û saziyên ku şandeyê serdana wan kir jî Salîha Aydenîz ev agahî parve kir: "Heta niha me bi Tevgera Goran, Tevgera Helwest, Partiya Beriya Gel, Waliyê Silêmanê, Serokkomarê Iraqê Abdullatîf Reşît re hevdîtin kirin. Me bi saziyên sivîl û demokratîk û bi gelek nivîskar, rewşenbîr û nûnerên civakî re hevdîtin kirin. Me bi nûnerên baweriyan ên wekî zerdeştî, kakaî, suryanî, êzidî û ol û baweriyên din re hevdîtin kir. Nêzîkatiyên tevan erênî bû. Hemûyan banga Aştî û Civaka Demokratîk ji nêzîk ve şopandine û piştgiriya xwe tînin ziman. Di vê pêvajoyê re polek mezin dikeve ser milê wan. Ji ber ku planên xerab ên Dewleta Tirk herî zêde li Başûr tên meşandin. Divê nûnerên partiyan û pêşengên civakê li dijî van planan hişyar û xwedî helwest bin."

Di berdewama axaftina xwe de Salîha Aydenîz, bilêv kir ku wan ji xwest ku partî û rêxistin bi rol û mîsyonên xwe rabin û wiha axivî: "Heta niha ji xeynî partiyên me tu kesî ji bo çareseriyê gav neavêtiye û neketine nava hewldanan. Me xwest hemû sazî û pêkhateyên li başûr berpirsiyariya dîrokî bidin ser milê xwe. Me xwest di pratîkê de helwesta xwe nîşan bidin. Hemûyan jî diyar kirin ku çi ji destê wan bê dê bikin."

**'Ji şandeyê bêtir agahiyan dixwazin'**

Salîha Aydenîz têkildarî daxwaza şandeyê ya ji rêxistinên sivîl û jî rawestiya û wiha berdewam kir: "Di van hevdîtina de hemû kes dixwazin ji bakur şandeyek bê. Dixwazin li ser naveroka bangê niqaşan pêş bixin. Di serî de saziyên başûr û beşên din ên Kurdistanê jî dixwazin şande têkildarî naveroka bangê wan ziyaret bike û li ser bangê niqaşan bikin. Ev ban dê bandeke çawa li ser çal aliyê Kurdistanê bike. Ji bo desthilat gavan bavêje divê zextên çawa li dewletê bêne kirin. Li ser van mijaran em axivîn. Me destnîşan kir ku êrîşa dewleta tirk tenê li ser Bakur nayên kirin. Di heman demê de li ser çar aliyê Kurdistanê êrîşên Dewleta Tirk hene. Me xwest her kes vê bangê wekî ku ji wan re hatiye kirin bigirin dest û fam bikin. Em armanc dikin ku ev bang baş bê famkirin û baş biirxînin û li gorî wê rol û rista xwe bi cih bînin. Her wiha em dixwazin li ser vê bangê çawa yekîtiya xwe ava bikin."

# Ji ber êrîşên Tirkiyeyê milyonek mirov bê av man

| Sosin Gulo

Endamê Komeleya Mafên Mirovan a Firatê Ahmet Dawut, bal kişand ser êrîşên li dijî Kobanê û diyar kir ku di encama êrîşên Tirkiyeyê yên 4 mahên dawî de milyonek mirov bê av û ceyran man.

Dewleta Tirk ji 8ê Kanûna 2024an ve êrîşên li ser herêma Kobanê zêde kirine. Ji 8ê Kanûnê heta niha di êrîşan de 17 jê jin bi giştî 105 welatî hatin kuştin. Ji 105 kesan 35 zarok in. Di êrîşan de 196 kes birîndar bûn. Ji kesên birîndar 43 zarok 50 kes jî jin in. Li aliyê din di êrîşê de 7 endamên asayîşê û 3 rojnameger hatin kuştin û 2 rojnameger jî birîndar bûn.

Dîsa di êrîşê de 2 karmendên tenduristiyê hatin kuştin û 5 kes birîndar bûn. Di van êrîşan de 6 ambulans bûn hedef û xerabûn û 6 dibistan hatin rûxandin. Gelek depoyên genim ku 1000 ton genim embar kiribû, talan bû. Dewleta Tirk li gel van êrîşan navendên karebayê û Bendava Tişrînê her tim kir hedef. Êrîşî stasyonên avê kirin û li gundê Şêxler stasyona avê kirin hedef. Vê stasyona xizmeta avê dida 366 gundan û tevahiya bajarê Kobanê. Hawizê avê ku avê dide 20 gundan hilweşandin. Ji roja êrîşan dest pê kiriye heta niha milyonek kes bê ceyran û bê av man. Ji ber av ji ser welatiyan qut bû bi hezaran jin û zarok nexweş ketin. Neçar man ku ava biran a naherike vexwin.

Balafirên şer ên Tirkiyeyê êrîşî fabrîqeyên zeytê jî kirin. Fabrîqeyên zeytê ku mehê 5 ton zeyt çêdikirin êdî nekarî xizmeta bajarê Kobanê bike û hilweşiya.

**50 hezar kes ji ber êrîşan koçber bûn**

Balafirên şer Stasyona benzînê yên li Sirrînê û nêzî 100 malên sivîl jî kirin hedef û rûxandin. 40-50 hezar sivîl ji ber êrîşan koçber bûn. Stasyonên avê li Eyn Îsa kirin hedef. Di 24ê Kanûna 2024an de navendên av, kareba, asayişê kirin hedef. Depoyên genim kirin hedef. Li vir kesek şehîd bû û 7 karker birîndar kirin.

Dewleta Tirk di êrîşên Bendava Tişrînê de 2 xizmetkarên tenduristiyê, şanoger Bavê Teyar û Rojnameger Egît Roj jî di nav de 17 welatî kuştin û 120 kes jî birîndar kirin.

**Li Kobanê ji sedî 95 ceyran tune**

Niha li Kobanê ji sedî 95 ceyran tune. Ji sedî 5 karebe heye. Dîsa ji ber ceyran tune av jî tune ye. Heta mehek berê welatiyan av dikirî.

Der heqê êrîşên Tirkiyeyê yên li dijî Kobanê û rewşa herêmê de Endamê Komeleya Mafên Mirovan a Herêma Firatê Ahmet Dawût agahî parve kirin û got: "Dewletên wekî Rûsya, Amerîka û Tirkiye tenê li ser esasê berjewendiyên xwe tev digerin. Naxwazin kes ji wan re bêje 'Tu şaş e' Saziyên mafên mirovan dikarin binpêkirinên mafan têxin qeydan û raporan amade bikin. Lê hêza wan a şer rawestînin tune ye. Dikare raporan amade bikin û bi raya giştî re parve bike. Raporan amade dike û pêşkêşî Saziyên Mafên Mirovan ên Navneteweyî dikin. Raporên van saziyan ji bo 10-15 sal şûnde rola wan baştir tê dîtin. Ev dibin hafiza û bîr. Ji bo hesab ji bersûcan bê pirsîn ev rapor girîn in. Em hewl didin binpêkirina mafan bidin xuyakirin û belge bikin. Îsal encam negire jî dê çend sal bûnde encamê bigirin. "

**'Dixwazin gelê kurd tune bikin'**

Li ser erk û rista partiyên siyasî yên kurd û meclise jî Ahmet Dawut rexneya "Partiyên me yên siyasî rola wan lawaz e. Divê xwedî hêz bin" kir û got: "Armanca êrîşên li ser Kobanê ew e ku gelê kurd tune bike û ji hemû mafê wan bêpar bihêle. Bi van êrîşan dixwazin gundan vala bike. Gel bê av û ceyran bihêle. Dixwaze kurdan koçber bikin û bê cih û war bihêlin. Partiyên me yên siyasî û saziyên mafên mirovan divê rist û erka xwe bilîzin. Êrîşa herî dawi ku li gundê Berxbotanê pêk hat. Lê me piştgirî neda gel. Diviya bû li ewropa meş çêbûbana. Kurd li pêş YE ,NY, Konsolosê, DMME û saziyên ewropa çalakî bihata li darxistin. Me dikaribû ev komkujî bikira rojev. Lê saziyên me zêde li ser ranewestiyan."

Ji bo çareseriyê jî Ahmet Dawud ev bang kir: "Em dixwazin li ser hemû bakur û Rojhilatê Sûriyeyê êrîş bi dawî bibe. Divê hemû welatiyên Efrîn, Serêkaniyê û Eyn Îsa tev vegerin axa xwe. Divê hesab ji van çeteyan bê xwestin. Divê hesap ji bersûcên şer bên xwestin."

## DI VÊ SERDEMÊ DE BI YEKITIYA GELÊ KURD

# Kurdistan dê bibe xwediyê pêşerojekê

■ Rohat Bulut

*Bi sedan salan e ku gelê Kurd ji bo azadiya xwe têdikoşe. Di vê rêyê de bedelên giran da û dide. Di her serdemekê de rêber û pêşengek derketiye ser dika dîrokê û ji gelê Kurd re pêşengî kirine. Piştî ku Kurdistan bi peymana Syks-Pîcot bû çar parçe jî pêşengên gelê Kurd her têkoşiyane û bi rista xwe ya pêşengî rabûne. Li bakurê Kurdistanê jî li dijî dagirkerî û mêtingeriya dewleta Tirkiyeyê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan zêdeyî 50î salin ji bo azadiya gelê Kurd têdikoşe. Abdullah Ocalan ji salên 90î ve ye dixwaze bi rêbazên demokratîk pirsgirêka gelê Kurd çareser bike. Gelek hewldanên çareseriyê pêş xist lê bi ser neketin. Herî zêde di salên 2013-15an de nêzîkî li çareseriyê hat lê ew jî bê encam ma. Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di 27ê Sibata 2025an de "Banga Aştî û Civaka Demokratîk" kir. Ev banga Abdullah Ocalan deng veda û rastî piştgiriyeke girîng hat. Di çarçoveya bang û perspektîfa Abdullah Ocalan a ji bo gelê Kurd û bandora wê em bi Waliyê Silemaniyê Dr. Heval Ebûbekîr re axivîn û pirsên me bersivand.*

*Birêz Heval Ebûbekîr di serî de ji bo ku te dem ji me re veqetand em spasiya xwe pêşkêşî te dikin.*

*Berî her tiştî ez dixwazim silav û pîrozbayiyên xwe pêşkêşî we bikim. Eger wekî Walî Heval Ebûbekir bikaribim bersiva pirsan bidim ji bo rojnameya Xewbûn û ajansê em ê gelekî kêfxweş û serbilind bin.*

***Hûn "Banga Aştî û Civaka Demokratîk" a Rêberê PKKê Abdullah Ocalan çawa dibînin?***

Ev destpêkxerî û pêngaveka girîng e, bersiveke agahdar, rasteqîne û zanistî ji bo qonaxeka hestyar û bi lez a rewşa herêmê û cîhanê ye. Di nav xwe de dê rê li ber aştiya civakî, aramî, asayiş û aboriyeke aramtir veke. Kurd û doza rewa ya kurdan weke aktorekî çareseriyê yê çalak û berpirsane di vê rewşa dijwar a herêmê û cîhanê de ew ê rojev û hewldanên ku herdem xwestine kurdan wek jêdera pirsgirêkan nîşan bidin bi temamî têk bibe.

***Ev peyam wê bandoreke çawa li Kurdistan, Tirkiye û Rojhilata Navîn bike? Çavdêriyên we çi ne?***

Ev peyam ne tenê peyameke teorîk an jî kesayetek e, lê belê îfadekirinek dîrokî û pratîkê ye. Gelek ked, afirînerî, karînên rêveberiyê û bersivek ji bo pêwîstiyên herî bingehîn ên heyî û pêşeroje û hebûnê ye. Siyaseta herêmê ew e ku dewletên herêmê (herî kêm 100 sal piştî Peymana Lozanê) fêm bikin ku kurd bi çekê nayên tinekirin û kurd wê nikaribin hemû mafên xwe yên rewa bi çekê bi dest bixin.

Banga aştiyê jî bêdengkirina çekan e û kilîta vekirina deriyê diyalogê ye, ku dê aştiyeke bîne Kurdistan û herêmê. Eger hikumeta Tirk samîmî be, dê aştiyek demdirêj û mayînde pêk bîne. Ev yek dê pirsgirêka kurdan a demdirêj çareser bike û çareseriyan pêşkêşî Herêma Kurdistanê û welatên herêmê û her wiha Tirkiye û Rojhilata Navîn jî bike.

***Demên borî jî ji hêla Abdullah Ocalan ve pêvajoyên çareseriyê hatibûn destpêkirin, lê ewqas nehat dîtin. Ev banga birêz Ocalan di raya giştî ya kurd, tirk û mirov dikare bêje ya cîhanê de dengveda û şîroveyên berfireh hatin kirin. Hûn çawa şîrove dikin?***

Di cîhanê de dijwariyên mezin, xeternak û nêzîk derketine holê. Şerên Ûkrayna û Fîlistînê, kêmbûna hêzên çekdarî, xirabûna jîngehê, kêmasiya enerjiyê, krîzên aborî, koçberî û karesatên xwezayî hemû nîşan didin ku pêvajoyeke krîzê ya gerdûnî dimeşe.

Li vê derê, têkoşîna kurdan û biryardariya Birêz Ocalan wekî çareseriyeke mumkîn tê dîtin. Gotin ku kurd, bi sebir û berpirsyariya xwe, dikarin bibin bersiva van pirsgirêkan. Bang li Tirkiyeyê hatiye kirin ku beşdarî vê çareseriyê bibe, ji ber ku ev tenê pirsgirêka kurdan nîne, lê krîzek herêmî û cîhanî ye.

Ji bo derbasbûna ji van krîzan, pêdivî bi peymanên navneteweyî, plansaziyeke nû ya aştîxwaz û hevkarî heye. Çareserî ne tenê ji bo kurdan, lê ji bo hemû gelan pêwîst e. Ev proses divê bi awayekî serbixwe û bi dilsozî were pêş xistin, da ku cîhan bikeve rêgezek aştiyê û stabîl.

***Piştî bangawaziyê ragihandina agirbestê ya PKK li gorî we nîşaneya çi ye û hûn çawa dibînin?***

Pêvajoya aştiyê ne tenê agirbestek an rawestandina şer e, lê guherînek bingehîn a fikrî û çalakî ye. Divê ev înisiyatîf bi biryardarî, zexmî û bawerî were şandin da ku peyama aştiyê bê guherandin û ji kelehên şerê bigihîje kelehên parastina maf û azadiyê.

Aştî ne nexweşiyek e ku bi tenê ji aliyê yek kesî ve were çareserkirin. Dewleta tirk, bi vê yekê re, dikare rola xwe ya dîrokî bidê lîstin û bi vê biryarî pêvajoya aştiyê bike pêvajoyek berdewamî. Ji ber ku şer çareserî nake, lê aşti jî bi tenê bi ramana xwe jiyan nabe. Pêdivî ye ku her kes ji bo vê guherînê bi awayekî çalak beşdarî vê pêvajoyê bibe. Di dawiyê de, aştî tenê bi biryarekî kolektîf û hevpar tê peydakirin. Divê hemû alî bi awayekî rast û dilsoz vê pêvajoyê piştgirî bidin da ku jiyaneke nû, bi rêkûpêk û azad derkeve holê.

***Li başûrê Kurdistanê rêze hevdîtin pêk hatin û pêyamên girîng hatin dayîn. Ev peyam dê bandoreke çawa li yekitiya kurdan bike? Her wiha piştî bangewaziyê, hem li Hewlêrê û hem jî li Silêmaniyê pêyamên piştewaniyê hatin dayîn, hûn peyamên ku hatî dayîn çawa dinirxînin?***

Civîn û nîqaşên girîng li Başûr, bi taybetî piştî ragihandinê li Hewlêr û Silemaniyê, nîşan didin ku pêwîstiya hevkariya navneteweyî û nêrîna Kurdistanê wekî beşek stratejîk ji nû ve tê pejirandin. Ev pêvajo dikare bandoreke erênî li ser Herêma Kurdistanê bike.

***1. Yekitî û têgihîştina nav-kurdî:***

Pêdivî ye ku Kurd li her deverên cîhanê bi awayekî hevkarî bin û rewşa hev baş fem bikin. Herêmên Kurdistanê ne tenê bi du partiyên sereke yên Başûr, lê bi hemî saziyên civakî, siyasî, çandî û akademîk re divê têkiliyên xurt ava bikin. Parlamento, hikûmet, zanîngeh, çapemenî û nûnerên gel divê beşdarî vê hevpeyvînê bibin da ku peyama yekbûnê bi awayekî gerdûnî were şandin.

***2. Girêdana başûrê Kurdistanê bi cîhanê:***

Serdan û danûstandinên Başûr divê ne tenê bi partiyên desthilatdar, lê bi tevahiya heremê de siyasî û civakî re bin. Tenê bi vê rengê dikare bawerî û biryardariya gel xurt bibe.

Rolê medyayê, zanîngehan û rêxistinên civakî di pêşxistina aştiyê de neçarî ye; divê peyama hevkarî ji sînorên siyasetê derbas bibe û bibe peyamek giştî.

***3. Bawerî û biryardariya gel:***

Heke ev pêvajo bi awayekî zelal û giştî were meşandin, dê gelê Kurdistanê xwe nêzîkî çareseriyeke hevpar bibîne. Lê divê ev yek ne tenê li Başûr, lê li her çar parçeyên Kurdistanê were destnîşankirin. Civînên Başûr dikarin bibin fersendek ji bo kurdan ku bi hev re bisekinin û peyama xwe ya yekîtî û aştiyê bi cîhanê re parve bikin. Lê ev tenê bi şertê hevkariya hundirîn û têkiliyên demokratîk pêk tê. Divê hemû alî bi awayekî wekhev beşdarî vê pêvajoyê bibin da ku Kurdistan bikeve rêzek nû ya aştî, xweserî û hevkariya navneteweyî.

***Bandora aştiya li bakurê Kurdistanê ya di navbera gelê Kurd û Tirkiyeyê de dê li aliyê dinê ên Kurdistanê çi be?***

Serkeftina pêvajoya aştiyê li bakurê Kurdistanê ne tenê çareseriyeke navxweyî ye, lê dikare bibe mînakeke gerdûnî ji bo doza kurdî ya li her deverên cîhanê. Lê ev serkeftin bi şertê ku:

✓ Aştî rasteqîn û bi îstîqrar be, ne tenê amûrek ji bo derbasbûna qonaxekê, lê armancek bi xwe.

✓ Adil be, ku maf û xwestinên gelê Kurd bi awayekî dîplomatîk û siyasî were pejirandin. Kurd divê xwe ne wek demkî, lê wek beşekî paşmayî ya ewlekarî, aborî û dewletbûna xwe bibînin. Ev tê wê wateyê ku:

***1. Aştî bibe bingehîn:***

Pêdivî ye ku pêvajoya aştiyê ne tenê bi agirbestekê re were sînordarkirin, lê bi guherînek siyasî, aborî û çandî ya berdewam re were girêdan. Divê aştî ji bo Kurd ne rêgezek demkî, lê stratejiyek dirêjdem be ku bibe bingehîn ji bo pêşveçûna neteweyî.

***2.Kurd wek aktîfek dewletbûnê:***

Divê kurd xwe wek beşek ji pêvajoya dîrokî ya dewletbûnê bibînin, ne wek bêhêziyek demkî. Pêdivî ye ku aborî, ewlekarî û saziyên xweseriyê bi awayekî stratejîk were pêş xistin da ku dewletbûn bi awayekî rast were avakirin.

***3. Bandora herêmî û cîhanî:***

Çareseriyeke aştî û adil a li bakurê Kurdistanê dê bibe mînakek ji bo herêm û cîhanê ku pirsgirêk bi rêya aştîxwazî û hevpeyvînê tê çareser kirin. Dê nîşan bide ku Kurd ne "pirsa demkî" lê beşek ji çareseriyên herêmî ne. Aştî li bakurê Kurdistanê, heke bi rastî adil û berdewam be, dê ne tenê pirsgirêkên navxweyî çareser bike, dê bibe mînak ji bo cîhanê ku kurd dikarin bi awayekî siyasî û aştîxwaz jiyana xwe bi rêkûpêk ava bikin. Ev pêvajo divê bi awayekî zelal û bi biryara gel were pêş xistin, da ku Kurdistan ne tenê ji şer xelas bibe, lê her wiha bikeve rêzek nû ya dewletbûn û pêşketinê.



Waliyê Silêmaniyê Dr. Heval Ebûbekîr li ser "Banga Aştî û Civaka Demokratîk" a Abdullah Ocalan axivî û got: "Divê Kurd dîroka xwe bixwînin. Îro ne dema pevçûnê, dema biryardariyê ye. Yekîtî dê bibe prensîba sereke û Kurdistan dê bibe xwediyê pêşerojekê."

***Aştî û demokrasiya ku pêş bikeve dê kêrî kê bê her wiha ku aştî û demokrasî nebe dê kî jê zirarê bibîne?***

Aştî, demokrasî û dadweranî ne tenê rêbaz in, lê pêdiviyek bingehîn in ji bo jiyana mirovahiyê. Em hemû, ji welatên herêmê heta cîhanê, dikarin ji vê rêwîtiyê sûd werbigirin:

✓ ***Aştiya takekesî û aramiya giştî:***

Bêyî aştî, tu pêşketin, azadî an jî geşbûn nayê. Divê em bi hev re bixebitîn da ku tolerans û qebûlkirina hevpişk bibe bingeha civakek aram.

✓ ***Ewlekarî û refaha aborî:***

Geloşên siyasî û aborî yên stabil, mirov dikare bêyî tirs ji pêşerojê re biafirîne. Pêdivî ye ku her welat xwe ji bo geşbûna nûjeniyê amade bike.

✓ ***Xwebawerî û hevkarî:***

Em nikarin tenê bijîn. Divê em bi hev re bixebitin da ku cîhanekî ku tê de maf, azadî û hevsengî heye ava bikin. Aştî û demokrasî tenê bi biryara me ve pêk tê. Divê em vê yekê wek berpirsiyariyeke gerdûnî bibînin û bi hev re bixebitin da ku cîhanekî aştî bi dadmendî û pêşketîtir ava bikin. Her kes dikare beşdarî vê guhertinê bibe. Aştî armanc e, lê pêvajo jî divê bi hev re were ajotin.

***Her tim yekitiya Kurdan tê axaftin lê mixabin çê nabe, li gorî we astengî çi ye? Kurd çawa dikarin li hev werin? Heke ev pêvajo bi ser bikeve dê rêya yekitiya neteweyî ya kurdan jî vebibe gelo?***

Kurd divê bi awayekî bêguman fam bikin ku serkeftina wan tenê bi yekrêzî û yekîtiyê tê garantî kirin. Ev prensîb ji hemû stratejiyên din bi bandortir e, ji ber ku dîroka 100 salên dawî nîşan dane:

✓ Dewletên desthilatdar ên herêmê êdî fehm kirine ku heke ew di vê serdemê de bi Kurdan re bi dostanî tevnegeriya ba, hegemoniya xwe ya herêmî ewqas bi zehmetî dirêj nedikirana.

✓ Herêm nedibû yek ji deverên herî bêarâm ên cîhanê û ew ê ziyanên mezin ên aborî û ewlehiyê nedîtana.

✓ Hêzên mezin ên cîhanê îsbat kirine ku heke ew bi Kurdan re hevalbend bûyana, dê hevaltiyek ji yên neteweyên serdest ên herêmê çêtir avakirana. Lê belê, ew neçar man ku bikevin bin kontrola xwe û bernameyên derve û îro di temenê xwe yê mezin de ne. Rewşa heyî, ku dewletên herêmê ji bo parastina beşekê ji ya ku di destê wan de mane her tişt winda dikin, ne stratejîk û ne jî domdar e. Kurd divê ji vê rastiyê ders bigirin:

✓ Yekitî tenê rêya rast e ji bo xweserî, ewlekarî û pêşketina neteweyî.

✓ Dostaniya kurdan ji bo hêzên herêmî û cîhanê bêtir sûd e ji stratejiyên tund û bêaqil ên îro.

✓ Sed salên windakirî nîşan didin ku ne Kurd û ne jî dewletên herêmê ji vê şerê bêdawî sûd nedibînin. Kurd divê ji dîroka xwe bixwînin: Yekbûn ne tenê rêya azadiyê ye, lê tek rêya domdariyê ye. Îro ne dema pevçûnê, lê dema biryardariyê ye. Yekîtî bibe prensîba sereke, û Kurdistan dê bibe xwediyê pêşerojekê.

**Spas ji bo alîkariya Fatoş Yildiz*






14
OTOBÛSÊN ME YÊN NÛ
Dikevin Ber Xizmeta Gel

CEJNA WE YA REMEZANÊ
Pîroz Be

ROŞANÊ ŞIMA YÊ REMAZANÎ
Bimbarek Bo

SERRA BUCAK | DOĞAN HATUN
HEVŞAREDARÊN BAJARÊ MEZIN Ê AMEDÊ

ŞAREDARIYA BAJARÊ MEZIN A AMEDÊ | /diyarbakirbld
ALO 153

CEYLANPINAR BELEDİYESİ
1960

# CEJNA WE YA REMEZANÊ
# PİROZ Û BIMBAREK BE

**Em Cejna Remezanê li hemû gelê xwe pîroz dikin, bi hêviya ku bibe sedema jiyaneke wekhev, azad û demokratîk û di heman demê de aştiya civakî**

## HEVSEROKATIYA ŞAREDARIYA SERÊKANIYÊ


CEJNA WE YA REMEZANÊ
PÎROZ BE
HEVŞAREDARANÊ
HACİ AKENGİN/AYSEL BARAN
ŞAREDARIYA PÎRANÊ
DİCLE BELEDİYESİ
1938

# CEJNA RAMAZANÊ

*pîroz be*

**ŞAREDARIYA DÊRIKÊ**

# CEJNA WE YA REMEZANÊ

Pîroz Be

**Em hêvî dikin ku dê Cejna Remezanê ji erdnîgariya me û hemû cîhanê re aştî, wekhevî, xwişk û biratiyê bîne, em cejna hemû hemwelatiyên xwe pîroz dikin**

**Leyla AYAZ - Siraç ÇELİK**

**Hevşaredarên Şaredariya Rezan**

# Cejna Remezanê *pîroz be!*

Bi minasebeta Cejna Remezanê em ji bo gelê xwe tenduristî, aşitî, azadî û aramiyê dixwazin. Em hêvî dikin ku Cejna Remezanê ji bo hemû mirovahiyê bibe sedema hezkirin, kêfxweşî û piştevaniyê. Em ji dil hêvî dikin ku Cejn li seranserê cîhanê di nava, yekîtî û wekheviyê de were pîrozkirin...

nusaybin
BELEDİYESİ

Hevşaredarên Nisêbînê
Gulbîn Şahîn Daghan&Selahattîn Ay



CEJNA WE YA REMEZANÊ

Pîroz Be

BERÎVAN GÜLŞEN SÎNCAR / CENGÎZ DÜNDAR
KAYAPINAR BELEDİYESİ EŞ BAŞKANLARI / HEVŞAREDARÊN PEYASÊ

# Cejna Remezanê

*pîroz be!*

Bi hêviya ku li xaka me bibe sedema aramiyê, rawestandina şerê dijwar ê bi salan tê meşandin û bêyî ku bêtir xwîn bê rêjandine aştiyeke mayînde biselihîne Cejna Remezanê di serî de li gelê me li tevahiya alema îslamê pîroz be!

SİLVAN BELEDİYESİ 1880

Sevîm BÎÇÎCÎ
Qedrî ESEN
Hevserokên Şaredariya Farqînê

*Bila Cejn Bibe Wesîleya Aşîtî, Biratî û Aramiya Civakî ya Gelê Me...*

# *Cejna We Pîroz Be!*

Safiye AKDAĞ
ŞAREDARIYA YENİŞEHİRÊ
YENİŞEHİR BELEDİYESİ
Mehmet ERGÜN

(0412) 228 96 54 www.diyarbakiryenisehir.bel.tr @yenisehirbld21

# Cejna Remezanê

## *pîroz be!*

Em di vê pêvajoya ku xweza bi kulîlkên reng bi reng xwe dixemilîne de Cejna Remezanê pêşwazî dikin.  Em Cejna we ya Remezanê bi hêviya jiyaneke aram, bêtundî û şer pîroz dikin. Hêviya me ew e ku hûn bi malbat û hezkiriyên xwe re cejneke xweş û geş derbas bikin.


ŞAREDARIYA ÇINARÊ
1937

Hevşaredarên Şaredariya Xana Axpar
Semra Akyuz- Mehmet Şerîf Arzû

# Roj Amara ra vejîya

Rojo ke rayîrê şarê kurdî roşnî keno, 4ê nîsana 1949î de dewa Amara ya Xelfetî ya Riha de vejîya. Rixmê pêro tecrîd û tedayan no roj hema zî şarê xo rê rayberîye keno û ver bi azadîye beno

Merkezê Xeberan



Tarîxê kurdan de xeylêk rayberî ciwîyayî. Mîsal Kawayê Asinkarî Îsayî ra ver serra 612yî de hêrişê seraya Dehaqî kerd, adirê Newroze wekerd û şarê xo azad kerd. Mîsal Şêx Ubeydullahî Colemêrg de peynîya seserra XIX. de vera Dewlata Osmanîyan xoverdayîşêko rûmetdar kerd.

Yewna Şêx Seîdî embazanê xo reyde serra 1925î de vera Komara Tirkîya xover da û bedelê giranî dayî. Dima ra Dêrsim de serra 1937î de Seyîd Rizayî şarê kurdî rê rayberîye kerde û têkoşînê azadîye ra çi hele fek vera nêda. Rejîmê tirkan vera kurdan her tewr zulm viraşt.

Nîjadperestîye, qetlîyamî, asîmîlasyon yanî bi kilmî polîtîkaya îmha ameye caardene. Gama ke serranê 1970an de têgêrayîşê PKK'yî dest pêkerd, her çî bedilîya. PKK hemverê biluskê netewe-dewlete sey "paratoner" peyda bî.

Bêguman rêxistine de merdimanê dîyarkeran ra yew Serekê PKK'yî Abdullah Ocalan bî. Ey serranê unîversîte ra pey zerrî daye embazanê xo, semedê têkoşînî însîyatîf girewt xo dest û dest pê xoverdayîşêkê bêhempayî kerd.

Serekê PKK'yî Abdullah Ocalanî xeylêk serran verî roportajêk dabî rojnameger Mehmet Alî Bîrandî. Uca de merdimo kurd sey "merdimo xerîb" pênas keno. Yanî merdimo ke şarê xo ra, xo ra, ziwanê xo ra û kamîya xo ra dûrî yo. Ocalan vano ke bedilnayîşê nê merdimî hende zî asan nîyo.

Armancê têkoşînî vurnayîşê hişmendîya nê merdimî yo. 40 serrî yo PKK hetêk ra vera cîyakerîye û asîmîlasyonî têkoşîn keno, hetekê bînî ra Kurdîstan de şorişê hişmendîye ano ca. Nê têkoşînî de fikr û formulasyonê Ocalanî wayîrê cayêkê berzî yê.

**Şorişê Rojawanî**

Fikro ke Amara de vejîya rîyê asmênî, bi taybetî na seserre çar leteyanê Kurdîstanî de tesîrêkê girdi virazeno. Pêro merdimîye şahidê şorişo ke Rojawan de ramîno bena. No şoriş zafane sey "sosyalîzmo lîberter" hesibîyeno. Kantonî, meclîsê şarî, komunî sey elementê cuya hempare vejînê vernî. Baxusus ciniyî nê şorişî rê serkêşîye kenê. Ciniyî hem xo îdare kenê hem zî hişmendîya camêrdî bedilnenê. Na çarçewa de Ocalanî aşma verêne ciniyan rê peyamêke erşawitbî.

Uca de dîyar keno ke "merdim têna bi azadîya ciniyan eşkeno şêro ver bi sosyalîzmî. Bê azadîya ciniyan kesêk nêeşkeno sosyalîst bibo. Camêrdo ke nêzano ciniyan reyde qisey bikero, nêeşkeno sosyalîst bibo. Sosyalîstbîyayîşê yew camêrdî pabesteyê formê têkilîya ey ya ciniyan o." Coka şorişê Rojawanî girîng û erjaye yo.

**Azadîya pêro şaran**

Şorişê Rojawanî bêguman kurdanê leteyanê bînan ê Kurdîstanî ser o zî tesîr keno. Demê ameyoxî de Bakûr, Başûr ve Rojhelat de hişmendîya komunale do qetî bêro awankerdene. Bêşik têna kurdî nê, pêro şar û îtîqatê bînî do sayeyê nê fikrî cuya xo awan bikerê. Serekê PKK'yî Abdullah Ocalan her tim vano ke "Çîyo ke muhîm o azadîya mi nîya, azadîya pêro şaran a".

---

Lêl AMED

# Ziwano ke vînî beno: **Çerkezkî**

Tirkîya de polîtîkaya ziwanî ya yewperestî ser o, zaf hûmarî de ziwanî ya vînî bîyî ya zî vînîbîyayîşî reyde rî bi rî yê. Çerkezkî zî çi heyfo ke aqubetê kurdkî cuyeno. Seba ke bi ziwanê dayîke perwerde nîno dayene, çerkezkî her ke şona vînî bena. Ciwanê çerkezî zî sey ciwanê kurdî bandora tirkî de mendê.

Neteweyanê Yewbîyayeyan ra Rêxistina Kultur, Zanist û Perwerdeyî (UNESCO) raporêk aşkera kerd û goreyê nê raporî; 7 hezar ziwanî dinya de yenê qiseykerdiş, labelê seyî ra 40î nê ziwanan çinbîyayîş û asîmîlasyonî reyde rî bi rî yê.

Tirkîya de 18 ziwanî çi heyfo ke ya helîyayî û ya zî vînî bîyê. Çerkezkî û lehçeyê çerkezkî zî sey ziwanê kurdkî zî polîtîkaya asîmîlasyon û qedexekerdişî ser o hîna binê telûke de yê. Sazgeh û dezgeyê ziwanî zî seba hîşmendî, balantişê telûkeyê asîmîlasyonî ser o xebate kenê la qîm nêkeno. Nika şima rê behsa rewş û gramerê ziwanê çerkezkî bikera. Peynî zî şima bivînî ke çerkezkî çi heyfo ke aqubetê kurdkî cuyeno.

Di lehçeyê çerkezkî est ê (adigehkî û kabardeykî). Çerkezkî ziwanê herêma Qafkasya ra ya.




**Fonetîkê gramerî yê çerkezkî**

***1. Fonetîkê vengî***

***- Zengînîya tîpê bêvengî:*** Çerkezkî hetê zafbîyayîşê tîpê bêvengî ra dinya de ziwanêko fînak o. (Lehçeya kabardeykî de 60 tîpê bêvengî, lehçeya adigehkî de zî 50 tîpê bêvengî est ê. Hûmara tîpanê venginan zî zaf kêm a.)

***- Zehmetîyê fonetîkî:*** Goreyê sewbînan pozîsyonan vengî est ê. Finak; vengê faringeal ve glottalî.

***2. Fonetîkê çekûyan:***

***- Zêdekerdeyî (Agglutinatif):*** Çekûyî peygir û qertefê zereyî reyde zêde benê. Finak; "sə-kʷə-ʁe-šʷ" (Ez to vînena).

- Antişê ergatif-absolutîfî: Fîîlî goreyê kerdox û objeyî yenê antiş. Têkilîya kerdox û objeyî tirkî ra cîya ya û nêzdê kurdkî ya.

***3. Pergalê fîîlî:***

***- Polipersonal agreement:*** Ahengê fîîlî hem goreyê kerdoxî hem zî goreyê objeyî est o. Finak; "Mi bide ci" sey têmîyane nê cumleyî yew fîîl de yenê îfadekerdene.

- Dem û rawe: Hetê raweya vîyarte, nika û ameyox de zaf hûmarî de raweyî zî est ê. Finak; (Waştiş, hewceyî, gumanî) est ê.

***4. Antişê nameyî:***

***- Zayend çin o:*** Nameyan de gramatîkê zayendî çin o.

- Pergalê rewşe (case): Sey absolutîf, ergatîf, oblîqusî 4-5 hebî qertefê rewşe şuxulyenê.

***5. Rêza çekûyan (sentaks):***

***- Pergalê SOV'î:*** Pêroyî rêza kerdox, obje û fîîlî bandorker a.

- Tedeyanê cumle de bestoxî: Cayê bestoxan, bi antişê fîîlan cumleya têmîyane ronîyeno.

**Rewşa çerkezkî ya rojane**

***1. Hûmara qiseykerdoxan û cografya:***

***- Welat:*** Dewleta Rusya ra girêda Komara Adigehî, Komaranê Kabardey-Balkar û Karaçayî de ziwano fermî ya la hûmara qiseykerdoxan zaf kêm a.

***- Dîaspora:*** Tirkîya, Sûrîye, Urdun, Îsraîl û Ewropa de nêzdî 3 mîlyon çerkezî cuyenê la zaferî ziwanê xo nêşuxulnenê. Tirkîya de zî xususî çerkezkî sînorê vînîbîyaye de ya.

***2. Ziwanê ke binê teluke de yî:***

- Goreyê raporê UNESCO'yî çerkezkî kategorîya ziwananê vînîbîyayeyan de ya.

- Çi heyfo ke mabenê ciwanan de çerkezkî nîna qiseykerdene, xususî mabenê ciwanan de ziwanê tirkî û ruskî zaf bandorker ê.

***3. Pawitiş û xebatê ganîkerdişî yê çerkezkî:***

***- Perwerde:*** Rusya de tay wendegehan de çerkezkî sey ziwano weçînite yena bonderkerdiş. Dîaspora de zî bi silgirîya komel û merkezê kulturî de sey kursan yena bonderkerdiş.

***- Çimeyê dîjîtalî:*** Ferhengê çerkezkî-îngilizkî/rûskî/tirkî. Dersa onlîne (Finak: CircassianLanguage.org), komê medyaya sosyale.

***- Xebatê kulturî:*** Bi deyîre, kayê tîyatroyî, festîvalan wazîyeno ke çerkezkî bêro ganîkerdene.

***4. Astengîyê sosyal û sîyasîyî:***

- Rusya de polîtîkaya ziwanî her tim bedilîyena. Bi ziwanê dayîke perwerde nîno dayene.

- Seba ke çerkezkî reyde perwerde nîno dayene, no ser problemê girdî yenê cuyayîş.

**Pêşnîyazê cigêrayîşî**

***- Çimeyê akademîkî:***

- Beşê Ziwanê Qafkasî yê Enstîtuyê Parîs INALCO'yî

- Kovara Journal of Caucasian Languages (JCL) de meqaleyî.

Cor de zî şima dî, bi xebate, deyîre, kayê tîyatroyî û dersa weçînite ziwanêk aver nêşono. Esil mesele bi ziwanê dayîke perwerde dayîş o. Eke kurdkî ser o xebatê xorîn û herayî nîrî kerdene, çi heyfo ke ziwano şîrîn kurdkî sey çerkezkî û ziwanê bînî biqedîyo. Ganî bi ziwanê dayîke perwerde bêro dayene, çimkî encax bi no rayîr merdim kokê xo ser şîn beno. Eke şima wazenê kurdkî vînî nêbo, ganî bi ziwanê dayîke perwerde ser o têkoşîn bêro dayene û bi kurdkî qise bikerê, biwanê û binusê.

---

Çengeyê Edebîyatî



# Hewnê mi

Îbrahîmê Xaşxaşe

Eşqê welatê ma, ro yê ma de ke nêherekîyêne
xeyal û hewnê ma yê renginî, serdinîya xerîbîye de
eşqê raştkênî ra marum mendêne,
sêwî mendêne.

Ez hewnê xo yê renginî de, kaleka Çilkanîya sipîye de
qevsingê waştîya xo ya bejntîtale û gerdangaze de bîya emşo.
Ma bi tesîrê axînanê xo yê vileçewtan û axûzarîya seran têvirane de,
bi îmgeyanê şîîranê sewda kay kerdêne derga-derg bi seatan.

Henî bibîme serxoşê eşqî ke,
çimanê ma ra helmê sewda sîyayê darîyêne we.

Rojî tîkila Koyê Bingolî ra
zê azebêde eşîre giran-giran û bi hûyayîşêde gulinî
çim şiknêne rê deşta Gimgimî.
Xoza wo ke hêdî-hêdî têra bîyêne, cuyê xemelnêne.
Vîçe-vîça çuçikan, qaqe-qaqa gorgeçînan
û xuşîna dere û derxuleyan ra eşq herekîyêne.
Vayê rojawanî yo ke nermik-nermik sipîtêne,
û porê waştîya mi şane kerdêne,
tivatêne ma rê kilamê sewda lornêne.


Dem rengin bî, ne derd bî, ne kî xem bî.

Seba ke tilsim mexerepîyo û romantîzmê demî mexelesîyo,
ma bi çekuyanê fîrazan xo rê Goşkar Babayî rê diwa kerdêne.
Ez û waştîya xo, kêf û refê xo de bîme û bextewar bîme.

Biluskî rê nêmano.
Bi gurêyîna kambaxî hewnê mi ke heremîya
tilsim kî xerepîya.
Banî, hîyate û kulînde pêser-pêser bî zê vergêde harî û ramit ra mi ser.

A hayleme de mi rê se bîbî nêzanena.
Seatan ra dima zuqaxanê Berlînî de ez tayê amaybî ra xo.
Şewê tarî û mijin,
cadeyî zîftin û xijin, hewa qirejin
Lê,- eza xeyalwêran kî gejin-gejin dormelayê banan de cêrêne çime şewe de.
Axx, ax...!
Biluskê kambaxî ke hewnê mi mexerepnêne,
mi çekuya xo ya peyêna efsunîye kî waştîya xo rê vatêne.

***Çime:*** Îbrahîmê Xaşxaşe, Azad, Weşanxaneyê Vateyî, Stenbol, 2023, rr. 47-50.



# xwebûn

31 Adar - 6 Nîsan 2025 / e-mail: rojnameyaxwebun@gmail.com / Hejmar: 276

**İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:** Abdullah Esen
**Sorumlu Yazışleri Müdürü:** Mehmet Ali Ertaş
**Yayın Danışma Kurulu:** Abdulla Peşêw
Adar Gulan
Heval Dilbihar
Ehmed Huseynî
Kakşar Oremar
Selîm Temo
Dr. Zerdeşt Haco
Munewer Azîzoglu Bazan

**Yayın Türü:** Haftalık Yaygın Süreli
**Yönetim Yeri:** Kooperatifler Mah. Kurt İsmail Paşa 2 Sk. Güneş Plaza No 18/22 **Yenişehir-Diyarbakır**
**Baskı:** Dicle Basın Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Blv. Batıkent Yapı Koop. 26/UA **Bağlar / Diyarbakır**

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsyar e.*

**Ji bo abonetiyê**
**Tel:** 0 (541) 806 84 85



# CEJNA REMEZANÊ
# LI GELÊN ME PÎROZ BE

**Em Cejna Remezanê li gelê xwe û alema Îslamê pîroz dikin; em hêvî dikin ku bibe sedema aştî, yekîtî û azadiyê. Em bang li her kesî dikin ku ji bo aştî, yekîtî, wekhevî û azadiyê têbikoşin.**

Ji bo ku desteserkirina îrade, bêhiqûqî û bêedaletiya ku li ser gelên Tirkiyeyê tê ferzkirin bi dawî bibe, divê em bi hev re têkoşîna demokrasiyê berfireh bikin. Em ji bîr nekin ku tu hêz, tu desthilat ne li ser wijdanê gel e.

Bi boneya Cejna Remezanê em careke din bang li rayedaran û desthilatê dikin ku pêwistiyên Banga Aştî û Civaka Demokratîk pêk bînin. Dema wê ye û derbas jî dibe.

Li van axan ji 7 salî heta 70 salî her kes bi salan e bi hêvî, bi bawerî û biryardarî li benda pîrozkirina cejnên di nav aştiyê de ne. Em tenê ne li bendê ne; ji bo vê têdikoşin, li ber xwe didin û dixebitin.

Em bawer dikin, em ê bi ser bikevin. Em ê cejnan jî jiyanê jî wekhev û azad bijîn. Em ê bi hev re Aştî û Civaka Demokratîk ava bikin.




www.demparti.org.tr iletisim@demparti.org.tr DEMGenelMerkezi